Rapora YASA ya mehane
Navenda Kurdî ji bo Lêkolîn û Rawêjkariya Yasayî

Cotmeh 2009



Ismaîl Dîko **Behcet Ibrahîm**

YA§A e.V.

Kurdish Centre for Legal Studies and Consultancy

Kurdisches Zentrum für juristische Studien und Beratungen

Navenda kurdî ji bo lêkolîn û rawêjkarîya yasayî

المركز الكردي للدراسات والاستشارات القانونية

YASA e.V.
Postfach 7624
53076 Bonn
www.yasa-online.org

Naverok:

- Çar xortên kurd li leşkeriya sûriyê hatin kuştin
- Malbatek kurd ji elmanya bo sûriyê hate vegerandin û yekser hate binçavkirin
- Li Dêrikê ahengek şûkirinê (Semavendek) hate qedexekirin û hunermendên wê hatin binçavkirin
- Hîna çarenivîsa birêz Behcet Ibrahîm Begê ne diyar e
- Ji bo Ibrahîm Biro heşt meh zindan
- Menal Ibrahîm Ibrahîm û Rojhat Subhî Mistefa hatin binçavkirin
- Sê hunermendên kurd bo dadgeha leşkerî hatin guhastin
- Li bajarê dêrikê xwendekarek û birayê wî hatin binçavkirin
- Şeş meh zindan ji du welatiyên kurd re

Çar xortên kurd li leşkeriya sûriyê hatin kuştin
Rêxistina mafên mirovan li sûriyê – MAF ragihand ku malbata leşkerê kurd Sadiq Hisên Mûsa, ji gundê Dodiyan ê girêdayî bajarê Helebê, roja duşemê 12.10.2009an nûçeya koçkirina kurê xwe yê leşker wergirt. Rayedarên artêşa sûriyê ji malbata wî ragihandin ku kurê wan di rûdaneke tirafîkî de derveyî koma xwe ya leşkerî jiyana xwe ji dest daye, lê piştî lêpirsînên malbata wî diyar bû ku kurê wan di bûyerek tirafîkê de û di nav koma leşkerî de hatiye kuştin.

Herwiha malbata leşkerê kurd Rêzan Ebdil Kerîm Mîrane, ji gundê Tilêlûnê yê girêdayî navçeya Dêrikê li bajarê Hesiçayê, roja yekşemê 11.10.2009an nûçeya koçkirina kurê xwe wergirt. Ji wan re hate gotin ku kurê wan di rûdanek tirafîkê de jiyana xwe ji dest daye.

Herwiha MAF ragihand ku leşkerê kurd Fîraz Bedrî Hebîb, sala 1988an ji dayik bûye, ji navçeya Bilbilê (Efrînê) ye, di roja 09.10.2009an di dema erkê parastina welêt de jiyana xwe di bûyerek tirafîkê de ji dest daye. Ev yek li gorî ku rayedarên artêşa sûriyê malbata wî agahdar kiri bû.

Ji hêla xwe ve rêxistina kurdî ji bo parastina mafên mirovan û azadiyên giştî li sûriyê DAD ragihand ku leşkerê kurd Silêman Ehmed Farûq Dîko ji gundê Qasim ê navçeya Raco (Efrîn) di roja 30.09.2009an de jiyana xwe ji dest daye. Silêman Dîko 5 mehên wî di lîwayê 88an de di komika 7an qediya bûn. Ji malbata wî re hati bû ragihandin ku di waneyeke werzîşê (Sporê) de ji nişka ve dilê wî rawestiyaye û êdî jiyana xwe ji dest daye.

Tê zanîn ku rûdana kuştina leşkerên kurd di dema pêkanîna erkê parastina welêt de li sûriyê ji 12ê avdara 2004an ve bêtirî 30 bûyerê bûye. Gelek rêxistinên mafên mirovan endîşeya xwe diyar kirin û doza vekirina vepirsînek dadmend û rewa kirin. Her demê jî rayedarên artêşa sûriyê ev bûyer weke bûyerine asayî ku çê dibin, nirxandine û gotine xwedêgiravê van xortan bi rêya elektrîk, xwekuştin an jî bûyerek tirafîkê de jiyana xwe ji dest dane.

Malbatek kurd ji elmanya bo sûriyê hate vegerandin û yekser hate binçavkirin
Rêxistina mafên mirovan li sûriyê- MAF ragihand ku desthilatdariya elmanyayê roja 08.10.2009an malbatek kurd vegerand sûriyê. Malbata Cindo di sala 2001an de koçberî elmanyayê bû bû, lê mixabin mafê penaberiyê bi dest ne xisti bû. Di heman roja girtina wan de li elmanyayê bo balefirgeha bajarê Frankfurtê hatin guhastin û bo sûriyê hatin vegerandin. Kesên ku hatin vegerandin ev in:

Dêya wan Şêxa Cindo (01.01.1953 ji dayik bûye) û her çar zaroyên wê:
1- Fatma Cindo (01.03.1987 ji dayik bûye).
2- Esed Cindo (01.02.1988 ji dayik bûye).
3- Welîd Cindo (01.01.989 ji dayik bûye).
4- Îmad Cindo (13.04.1990 ji dayik bûye).

Ji dema ku ev malbat bû sûriyê hatiye vegerandin çarenivîsa wan ne diyar e. MAF ragihand ku di şeva girtina wan de du kurên Şêxa Cindo ne li malê bûn:
Hesen Cindo (10.07.1975 ji dayik bûye).
Hisên Cindo (03.02.1979 ji dayik bûye).

Ji ber vê yekê ew li elmanyayê man û heya aniha jî ji ber tirsa vegerandina bo sûriyê ne diyar e ku ew li ku ne.

Li Dêrikê ahengek şûkirinê (Semavendek) hate qedexekirin û hunermendên wê hatin binçavkirin
Rêxistina kurdî ji bo parastina mafên mirovan û azadiyên giştî li sûriyê DAD ragihand ku komek hevbeş ji ewlekariya siyasî û ya tewankariyan li navçeya Dêrikê-Parêzgeha Hesiçayê roja şemiyê 03.10.2009an êrîş birin ser ahengek şûkirina (zewaca) xortekî kurd û birayê wî û hunermendên ahengê binçav kirin.
Herdû hunermendên kurd Cemal Seedûn û Nûhat Yûsif bi behaneya ku stranên kurdî yên netewî dibêjin hatin binçavkirin. DAD ragihand ku kesên girtî pêrgî lêdan û lêxistinê hatin û ji bo şaxê ewlekariya komarê li Qamişloyê hatin guhastin.

Hîna çarenivîsa birêz Behcet Ibrahîm Begê ne diyar e
Roja sêşemê 20.10.2009an komek ji hêzên ewlekariya ramiyarî ya bajarê Amûdê birêz Behcet Ibrahîm Begê – Bavê Şeno binçav kir û paşê bo şaxê ewlekariya ramyarî ya bajarê Hesiçayê hate guhastin. Birêz Behcet Ibrahîm Begê di sala 1951an de ji dayik bûye, zewicî ye û bavê şeş zarokan e. Tê zanîn ku birêz Behcet Ibrahîm Begê mirovek pir çalak e nexasim di warê çandî û civakî de û

herwiha di karûbarê gelemper de. Rêxistinên mafên mirovan li sûriyê derbarê Birêz Behcet Begê endîşeya xwe diyar kirin û doza azadiya wî kirin.

Ji bo Ibrahîm Biro heşt meh zindan
Roja 21.10.2009an dadgerê leşkerî yê bajarê Qamişlo biryar di derheqê Birêz Ibrahîm Biro de da, ku ew dê heşt mehan di zindanê bimîne. Ev biryar li gorî bûjena 288an ji yasaya sezayên sûriyê hatiye standin. Birêz Ibrahîm Biro endamê komîteya ramyarî ya Partiya Yekîtî ya Kurd li Sûriyê ye û di roja 29.04.2009an ji aliyê şaxê ewlekariya komarê ve li Qamişlo hati bû binçavkirin.
Ji aliyekî din ve di roja 05.10.2009an de dadgerê tek ê leşkerî li Qamişlo biryara sê meh zindan li welatiyê kurd Kêfxweş Ednan Yasîn birî û ew bi arandina kînên zam û zavî tewanbar kir. Herwiha bi Kêfxweş re gerdeniyek hati bû dîtin ku xwedêgiravî mîna ala kurdî bû, bi wê behanyenê jî hati bû binçavirin.

Menal Ibrahîm Ibrahîm û Rojhat Subhî Mistefa hatin binçavkirin
Hin rêxistinên mafnas li sûriyê ragihandin ku di roja 15.10.2009an de komek ji şaxê ewlekariya ramyarî ya bajarê Helebê êrîş bir ser mala welatiyekî kurd li taxa Eşrefiyê û welatiya Menal Ibrahîm Ibrahîm binçav kir. Menal Ibrahîm Ibrahîm ji bajarê Qamişlo ye û endama hevgirtina stêrik a jinan e ya ku girêdayî partiya PYD ye. Herwiha welatiyê kurd Rojhat Subhî Mistefa (1992 ji dayik bûye) ku ji gundê Remezan ê girêdayî navçeya Efrînê ye, hate binçavkirin.

Sê hunermendên kurd bo dadgeha leşkerî hatin guhastin
Ewlekariya ramyarî ya bajarê Dêrikê sê hunermendên kurd bo dadgeha leşkerî guhastin. Ew jî ev in: Nûhat Mehmûd, Dijwar Munîr Marûf û Ciwan Munîr Marûf. Ev hersê hunermend bi hunermndê kurd ê navdar Cemal Seedûn re di semavendekê de hati bûn binçavkirin û li wir hin stranên kurdî yên netewî goti bûn. Heya aniha hunermend Cemal Seedûn li ba şaxê ewlekariya ramyarî ya bajarê Hesiçayê girtî ye û tu agahî derbarê rewşa wî tunene.

Li bajarê dêrikê xwendekarek û birayê wî hatin binçavkirin
Di roja 28.10.2009an de û di dema ku xwendekarê kurd Welat Eyûb li geracên otobîsan li bajarê Dêrikê rawestiya bû daku biçe zanîngeha xwe berdewam bike, çenteyê wî ji aliyê asayîşan ve hate velokirin û kaxetek ku helbestek bi zimanê kurdî li ser hati bû nivîsandin pê re hate dîtin û yekser hate binçavkirin, paşê ji bo şaxê ewlekariya Hesiçayê hate guhastin. Piştî wê bi du rojan komek ji ewlekariya ramyarî êrîş birin ser mala birayê wî Selah Eyûb û ew jî binçav kirin. Heya aniha çarenivîsa wan ne diyar e.

Şeş meh zindan ji du welatiyên kurd re
Dadgerê tek ê leşkerî li bajarê Qamişlo biryar di derherqê du welatiyên kurd bi şeş meh zindan û sezaya pereyan bi 100 hezar L.S da. Biryar di derheqê van kesan de hate standin:
Mihemed Seyfedîn El Xido (Ji Dirbêsiyê ye û di sala 1986an de ji dayik bûye).
Nadir Newaf Xelîl (Ji Dirbêsiyê ye û di sala 1981an de ji dayik bûye).

Herdû welatiyê kurd li gorî bûjena 288 û 307an ji yasaya sezayên sûriyê bi endamtiya rêxistinek ramyarî û qedexe û arandina kînên zam û heremî, hatin tewanbarkirin.

Tê zanîn ku herdû welatiyên kurd di demeke borî de ji aliyê ewlekariya ramyarî ya bajarê Dirbêsiyê ve hati bûn binçavkirin. Ew bi belavkirina belavok û daxuyaniyan, doza têkoşînê, venasîna pirsa kurdî û çalakiyên wan di koma Zîlan ya girêdayî partiya PYD de, hati bûn tewanbarkirin.